

Dr.Nûredîn Zaza
1919 - 1988

# NEW ROZ

Xebat ji bo :
* Zordarî ji ser gelê me yê Kurd li Sûriyê rabe.
* Azadiya demokrat û rêzgirtina mafên mirovan.
* Mafên gelê Kurd ên netewî di çarçewa yekîtiya welêt de.



Osman Sebrî
1905 - 1993

*Ji weşanên Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê*

Hejmar ( 133) Sal 22 Gelawêj 2017 z - 2629 k Êmêl : Newroz@yek-dem.com Buha (75)L.S


# Pirsa Navsalan, Pirsa Bi Şewat !

**Desteya sernivîser**

Mişextbûna ku bi egera qeyrana Sûryê rû da, gelek guhertin û pirsgirêkên civakî yên giran bi xwe re anîn. Mişextbûn, penabertî, bêmalî, sêfîlî, buhabûn, bêxwendinî, malgirtin, kedxwarî, guhertina gelek sincî û gerdişên civakî, hemî ji encamê şerê navxweyî ne û wek kurman ketine govdê civakê û wî diherifînin.

Ji bilî wan hemî tiştan, şerê navxweyî êşeke civakî ye giran û mezin jî bi xwe re anî, ew jî bi taybet bi ser mirovên navsal de û jiyana wan dijwartir kir.

Roja îro li piranî eger em ne bêjin li hemî gund û bajarên me, bi sedan pîrejin û pîremêr bi tenê û bêkes mane, kesekî li wan binêre û xizmet wan bike nemaye û ketine rewşine pir kambax. Bi rastî pirseke mirovî ye pir bi êş û giran e, berê li nav civaka me tune bû.

Wek tê zanîn, kesên (xwedî pêdviyê taybet) û mirovên navsal hemî bi pêdviya tişt û xizmetên rojane û taybet in. Piraniya wan nikanin buhaya cil, xwarin, vexwarin û dermanê xwe peyda bikin. Eger peyda bû jî nikanin xizmet xwe bikin, xwe bişon, veşon, îdare û xizmeta xwe û mala xwe bikin. Eger kesek ji wan nexwaş bû, ........... 2

## Di Radyoya Êrîvanê de Dengê Kurdî



«Xwendekarên Kurd guhdarî radyoya Êrîvanê dikin»

Li sala 2016 an, ji Pirtûkxana Isma´îl Bîşekcî – Turkiye, pirtûka nivîskar Zêrî Înanç bi navnîşana «Di Radyoya Êrîvanê de Dengê Kurdî» bi zimanê Kurdî û Turkî derket û belav bû. Pirtûk ji 328an rûpelan pêk tê.

Di pirtûkê de nivîskar xuya dike ku bandora Radyoya Êrîvanê - Beşê Kurdî di parastin û pêşxistian ziman û çanda Kurdî de pir mezin bû, bi taybetî jî li ba Kurdên Turkiyê û bêtirî 10000 saz û stranên Kurdî di doseya radyoyê de hene.

Tê zanîn ku, Dengê Kurdî li Êrîvanê sala 1955 an li ser destê Prof. Casimê Celîl vebû û ciyê dilxweşiya Kurdan bû li hemî deverên Kurdistanê.

Hevpeyvînek bi lêkolîner Zêrî Înanç re bi zimanê Turkî çêbûye, ew jî di vê malperê de ye:

http://www.agos.com.tr/tr/yazi/17703/erivan-radyosunun-kurtce-yayinini-dinlemis-her-kurdun-anlatacagi-seyler-vardir

## Daxuyanî Ji Raya Giştî Re .......



**Ji keç û lawên herêma Efrînê re……**

Di nav tevliheviya kirîza Sûriyê û zêdezoriya dijkeriya gefgurên Turkiyê û hevalbendên wê li dijî xelkên herêmên Efrîn û Bakurê Sûriyê bi tevayî, li ber roniya têghişweriya Rêvebiriya Xweser û çêtiriyên perensîpa nenavendî ji rêvebiriya civakê re, pêdiviyên mersûma(3) ya ku ji Encûmena Damezrênerî ya Federaliya Demokrat a Bakurê Sûriyê- ya ku partiya me beşek jê ye- derketî, û bi armanca kedayîna bi hev re ji bo hêsankirin û peydakirina karguzariyên pêwîst û pêdiviyên berdewamiya jiyanê, parastina aştiya xelkî, jiyankirina hevbeş û geşkirina hişweriyeke hilbijartinî li ser ... 3

# Dest bi dest ji bo biserxistina Federaliya Demokrat a Bakurê Sûriyê

**Qaziqlî Mihemed**

Piştî ku kirîza Sûriyê gihîşte vê astê ji tarûmarkirin û wêrankirinê, ne gengaz e ku Sûriyê weke berê bi şêwakî navendî were birêvebirin. Ger rast li çareseriyekê ji vê kirîzê re tê gerîn, çareserî tenê di nenavendiya destlatê de ye. Şêwe û rengên nenavendiyê pir in, federalîzim jî cûreyek ji cûreyên wê ye; Kurd jî ji zû ve li gel pirojeyên nenavendiya vî welatî bûn û wek çareserî pêşniyar dikirin û hîn dikin.

Pirojeya destpêkirina federalîkirina Sûriyê ku Hevbendiya Niştimanî ya Kurd li Sûriyê –ku partiya me ji damezrênerê wê ye- li ber roniya Kongira Rimêlanê ya diwem a ku Hevbendî tê de beşdar bû hate danîn.

Hilbijartinên herêmên federal wê li ser sê astên hilbijartinî û li her şeş kantonan were sîstemkirin û avakirin, ew jî Hesekê, Qamişlo, Girê Sipî, Kobaniyê, Şehba û Efrînê. Lê gengazî heye ku di rojên pêş de feretir jî bibe. Di vê karnavê de çendî kêmkasî hebin jî, lê ji ber ku çavên raya cîhanî û dewletên xwedî rol di dosya Sûriyê de li herêmên me ne, ewê li encaman binêrin û binirxînin kanî pêkhateyên Bakurê Sûriyê bi beşdariya Kurdan wê kanibin çi bikin û bi çi rengî



vê pirojeyê bi rê ve bibin? Her weha destlat û hemî aliyên xêrnexwaz jî wek Turkiye, Îran û rikberiya ku di hembêza Turkiyê de ku ava serê me germ dikin û bi her awî hewil didin ku vê pirojeyî ji bin de biherifînin û hilweşînin. Vêca gerek e em ne sêrcî û keysebaz bin, li berevajê wê ji me tevan tê xwastin em çalaktir bin, bi şêwakî lêhatî ciyê xwe di nav de bigirin û bi her awakî hewil bidin ku ew hilbijartin û nimûna Federaliya Demokrat a Bakurê Sûriyê bi ser bikeve û weke mînakeke ronak ji Sûriyeke Federal re were nîşandan.

Hêvî ew e, ku hemî aliyên Kurd û pêkhateyên din ên pişikdar serkeftina vê pirojeyê ji xwe re bikin armanc, da ku em bi hev re di vê xebatê de bi ser bikevin û xizmetekê pêşkêşî Gelê Sûriyê bi tevayî û Gelê Kurd bi taybetî bikin.

---

**Pirsa Navsalan............ Dûmahîk**

kesek li kêleka wan ne tê dîtin; eger cîranekî bi qîret li kêleka wan hebe jî, ew dîsa rewşê durust nake û nabe çareserî.

Wek em dibîsin û dibînin, gelek kesên navsal bi rojan di binê malan de dimînin, kesek li wan napirse û peyalek av nade wan. Di van çend salan de bi dehan navsal û nexwaş di binê malan de mirine û piştî çend rojan xelk pê haydar bûne!.

Erê qeyrana Sûryê û guhertinên ku bûn li derveyî vîn û daxwaza civaka me bû, lê belê em jî wek piraniya xelkê Sûryê tûşî encamên wê bûne û derd û kulên wê jî dikşînin. Lewre jî em neçar in bi tiştê pê kanin bikin û derman û çareyan jê re bibîn, pirsek jî jê pirsa navsalan e.

Belkî li civakê pêşketî, civak û dewlet di ber karûbar û jiyana nasalan de dibine berpirsiyar; ew wan radikin, datînin, xizmet wan dikin, ta rêwresmên mirina wan jî li xwe digirin. Lê li nav civekeke mîna civaka me, zarok di ber xizmeta navsalên xwe de berpirsiyar in. Lê belê beşekî gava beşekî mezin ji law, keç û neviyan jî mişext bûn, dê û bav bêkes di binê xaniyan de man, li wê çaxê bobelatek civakî û mirovanî çêdibe, û belkî carina dandina zerikek av, an destgirtinek ji bo çûna destavê bi sed Dolarên ku belkî jê re ji ba zarokan werin dike û hîn bêtir jî.

Li aliyê din, civak û Rêvebirya Xweser jî wekî



ku aliyê fermî li welêt tê dîtin û şûna dewletê digire, ta roja îro hîç guh ne dane vê pirsê û belkî pê ne ramî bin jî. Tenê xelkê gund û cîranên bi qîret, beşekî mezin ji pirsa xizmeta navsalan rakirne û azarên wê li wan sivik dikin.

Roja îro li piraniya gundan rêxistinên Komînan çêbûne, pir giring û pêwîst e ku ew xizmeta navsalên bêkes bike beşek ji erk û stûbariyên xwe û civaka xwe ji tarûmarbûn û wêranbûnê biparêze.

Di vî warî de, gazinên mezin ji kesên xwedî sermiyan tên kirin. Digel ku gelek kes di rewşên vê qeyranê de bûn xwedî milyaran, lê ta roja îro yekî ji wan xwe ne daye ber û hewil ne daye ku malekê ji bo xizmeta navsalan li navçeyên xwe ava bike. Ma çi ziyan wê bigihê pirojeyên dewlemendekî yan paça Rêvebirya Xweser, eger di nav bi sedan pirojeyên xwe yên aborî de ((Maleke Navsalan)) jî ava bikin û kar û xizmetekê ji dê û bavên xwe re bikin!!. Bê guman, kare û xizmeteke wiha wê ji her aliyekî de sûdar be û ciyê pesin û rêzgirtinê be jî!.

# Emerîka Di nav Mayînan Re Dimeşe!



Qeyrana Sûryê rewş û nîrên pir nakokber, têkilhev û lihevketî ne tenê li Sûryê, lê li seranserî Rohilata Navîn peyda kirin. Ji despêka wê de û ta roja îro, piraniya dewletên herêmê neçar bûne têkevin nava pirsgirêkên gêjgerîna wê û pêwendiyê nû li gel hev, an li dij hev peyda bikin. Ji ber ku her alî û dewletek dixwaze destekî xwe di bûyerên herêmê de bi tevahî û di rewşa Sûryê û paşeroja wê de bi tayebetî hebe, bi cih bike, sûdê jê wergirin û berjewendiyên xwe biçespîne.

Hêz û rêxistinên têrorîst jî, wek Rêxistina El Qa`îde û şopgirên wê jî..?, derfet ji qeyranê wergirtin, geş bûn, sînorên Sûryê derbas kirin û kenca xwe avêtin ne tenê dewletên Rohilata Navîn, lê ta gihîştin Ewropa û Emerîka jî. Wê yekê kir ku ew dewlet neçar bibin, xwe ji rewşa Sûryê ve nêzîktir bikin. Li ser wan rastiyan hevpeymana nevdewletî bi serokatiya Emerîka hate avakirin û şerê li dijî terorê li Sûryê û Îraqê li xwe girtin. Loma jî, roja îro gelek dewlet û aliyên nakokber di şerê Sûryê de beşdar bûne û karên xwe bidizî û eşkre dikin. Di nava van rewşan de, Emerîka jî, wek dewleteke mezin û xwedî biryar di nav rewş û nîrên nakokber, têkilhev û lihevketî de ku li Rohilata Navîn peyda bûne siyaseta xwe bi rê ve dibe û li ser deh benan dilîze.

Ji aliyekî de dibêje ew li dijî Sazûmana Îranê ye û jê re kêran tûj dike, lê li aliyê din, li gel Îranê dost û parêzerê Sazûmana Bexdadê yê sereke ye.

Ew dosta Tirkiyê û hevalbenda wê ya heftê salî ye; lê destê xwe daye Hêzên Sûrya Demokratîk û Tevgera Civaka Demokratîk Tev-Dem, û bi her awakî piştê didê û baskên xwe di ser re vedigire.

Dewleta Qeterê ji aliyê çar dewletên erebî ve, wek Si`ûdiye û Misirê bi pişgiriya terorê hatiye tewanbarkirin, lê Emerîka pêwendiyên xwe ji Qeterê nabire û baregeha xwe ya herî mezin li geştîxana bajarê Dewha paytexta Qeterê ye.

Emerîka dosta Herêma Kurdistana Îraqê ya herî nêzîk e, û di şerê li dijî terora ÎSÎSê de pişgira wê yê sereke bû, lê seba xatirê Bexdadê pirojeya Hewlêrê ya rapirsînê durust nabîne û paşdedana wê pêşniyar dike.

Ev e tiştê ku di ser re dibe, tiştê ku di bin re dibe û tê kirin jî em nabînin. Rastiya siyaset û helwestên rêvebiriya Emerîka li derbara dewlet û pirsgirêkên Rohilata Navîn baş ne zelal e, ew çi ne û wê li ser çi helwestê raweste nemaze li derbara Sûryê?. Tenê rastiyekê ji siyaseta Emerîka naskirî diyar e, ew jî: Ew li gora berjewendiyên xwe û parastina ewlehiya dosta xwe ya herî nêzîk Îsraîl dixebite û siyaseta xwe dimeşîne. Wekî din, ta niha siyasetên wê, nemaze rêvebirya wê ya nû, ne diyar û ne ciyê baweriyê ne jî.

Zêrevanên siyasî, alavên ragihandinê û ji mafê xelkê ye jî ku vê pirsa rewa bike û dibêje: Piştî têkbirina hêzên teror li Sûryê û Îraqê, ta kengî, yan çi pêwîstî û berjewendî dê hebin ku Emerîka di nav mayînên Rohilata Navîn re bimeşe, hevpîvan û terezûya ku ji dehsalan de li herêmê heye bişkîne û ji bo xatirê Kurdan sergêjiyekê ji xwe û ji dostên xwe yên mîna Tirkiyê re peyda bike? Nemaze jî eger em zani bin ku her sê mebestên Emerîka yên sereke li Rohilata Navîn, eger ne tekûz be jî, pêk hatin, ango ewlehiya Îsraîlê, pitrol û peryên dewletên kendavê?. Ma partî, hêz û siyastmedarên Kurd li Başûr û li Roava, ta kîjan radeyê kani bin, xwe ragirin û di meşa di nav mayînan re hiş, end û dilêr bin?!

---

**Daxuyanî .... Dûmahîk**

bingehe û bereçûneke demokrat û berpirsiyar, da ku perensîpa "mirovê lêhatî ciyê lêhatî bistîne cî bigire",em bang li hemî hemwelatî, dost û hevalên xwe dikin, da ku li (22) heyva Rezberê berê xwe bidin sindokên dengdanê, ji bo hevserokatiyên komînên Kantona Efrînê hilbijêrin. Di heman demê de jî ,em li ser girîngiya bikaranîna maf û erka pişikdariya vebijartina azad a dûrî pevgirêdana olî, bineolî, netewî û bîrdozî tekez dikin. Bila silogana me dest bi dest ji bo:

*-Parastin û xizmeta gelê me û xurtkirin û bi hêzkirina kanînên wî yê berevaniyê.*

*-Belavkirina çanda hevkarî û karê hevbeş.*

*-Rêzgirtina dara zeytûnê û parastina dilopê avê.*

*-Aştî, Azadî û Wekheviyê.*



**Komîta Rêvebir Ya Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê-Efrîn-**

20.8.2017

# Ji çalakiyên saziya zimên (SFPZK)

Li navenda Isma›îl Umer a partiya Yekîtî ya Demokrat a kurd li sûriyê li bajarê Qamîşlê, li roja 242017/8/an, Şaxê Rewşen yê Saziya Fêrkirin û Parastina Zimanê Kurdî, ezmûnek niviskî ji şagirtan re kir, mebest ew bû ku asta wan nas bike û korsine fêrkirinê li gora asta zanîna wan ji wan re veke.

**Komîta ragihandinê ya şaxê Rewşen ya SFPZK.**




# Serxwebûna Kurdistanê

**Merwan berekat**

Wekî ku çawa ji mafê her miletekî ye azad û xwedî dewlet be, herweha û li gor zagonên navdewletî mafekî rewa ye ku gelê Kurd jî xwedî dewlet û Kurdistaneke serbixwe be. Di dîroka xwe ya nûjen de Kurdan bi dehan serhildan û şoreş ji bo azadiya gel û welatê xwe rakirin û bi sedhezaran qurbanî û pakrewan dan; lê mixabin hertim hêzên navdewletî yên ku serpereştiya hevpeyman û lihevkirinên li herêma Rojhilata Navîn dikirin, rola wan di perçebûna Kurdistanê û ne azadikirina gelê Kurd de hebû. Bêguman serûberê siyasetê berjewendî ye û hîngê berjewendiyên wan dewletan dibûn sedema ku Kurd û welatê wan weha bimîne. Lê siyaset guhêrbar e û li gor berjewndiyan zû xwe diguhêre.



Piştî şerê cîhanê yê duyem nexşeyek ji Rojhilata Navîn re hate danîn û dewletine nû hatin binavkirin, lê mixabin ne tenê Kurd ji wê nexşeyê bê par man, lêbelê welatê me Kurdistan jî li wan dewletan parve kirin. Rêjîmên wan dewletan bi hemû kanebûna xwe hewil dan ku gelê Kurd ji kok de rakin û her tiştê wan ê netewî bi wan bidin jibîrkirin. Lê pêlvedana berxwedan û şoreşên Kurdan ranewestî û her gelê Kurd li ber xwe da. Ji ber wê jî dewletên mezin ên ku siyaseta navdewletî rêve dibin, têgihîştin ku tucarî hêminî û aramî di herêma Rojhilata navîn de çênabe, ger gelê Kurd di rewşa heyî de bimîne. Ya din baş têgihîştin ku Kurd miletekî aştiyane û mirovperwer e, ji wê bêtir ew têgihîştin ku Kurd dikarin şerê terorê bikin û tucarî mejiyê wan terorê napejirîne. Ev yek ji hin sedemên ku dihêle Ewropî û Emerîka ne li dijî maf û têkoşîna Kurdan bin, nemaze mafê wan ê çarenûsê di riya rapirsînê re, serxwebûn jî di nav de.

# Tev Dibêjin Ziman Jiyan e!

**Memê Alan**

Dibêjin ziman jiyan e, hebûn û nasnama netewî ye. Ev gotin û salixdan rast in. Li rex van gotinan, berketî û hezkirên zimanê kurdî, bav û bapîr, stiranbêj, helebestvan, nivîskar, rewşenbîr, zimanhez, zimanzan û saziyên zimanê kurdî, ji roja roj de hewildane ku vî zimanê şêrîn û resen bidin fêrkirin, biparêz in û di nav zimanên cîhanê de zindî bihêlin.

Di vî warî de, li hember gefûgur û pîlanên rijîmên dagîrker, gelek berxwedan û berevanî hatine kirin û qelengekî ne hindik hatiye dandin. Ji şopandin, binçavkirin, heps û zîndanan de bigir, ta bigihê canfîdakirinê. Ev yeka ji piraniya xelkê ve ne veşartî ye û aşkere ye. Bi rastî jî ev xebata dûr û dirêj ji aliyê




xebatkarên zimanê kurdî ve, kêm-zêde, encamê dide û serketî dibe. Çimkî wê nehîştiye ku zimanê me dê were pişaftin. Ji ber wê, ev ton xebata ku di ber zimanê kurdî de hatî kirin, ciyê rêzigirtinê ye. Lê pirsa ew e, ma ew xebata ji bo zindîkirina zimanê kurdî bes dike? Di vî warî de, weke em dibînin biryara ku rêvebiriya xweser a kantonên kurdî standiye -çendî têbîn li ser hebin jî- biryara fermîkirina zimanê kurdî li herêmên kurdî li Bakurê Sûryê gaveke dîrokî bû, pêwîst e hemî lê bibin xwedî.

# Rola raghandinê û bandora wê li ser civakê

**Nazdar Hesen**

Ji ber ku raghandin bi erka belavkirina nûçe, agahî û bûyerên nû qewimîne radibe û her roj li ser radyo, televziyon, rojname û alavên din ên ragihandinê têne belav kirin û ji aliyê gelek kesan ve jî tê şopandin, loma jî rola wê pir girîng e û bandoreke pir kûr û mezin li ser kesên ku dişopînin dike. Bi pêşketina zanîn û teknolojiyê (Internêt.. û hd) û cûrbecûrbûna malper û alavên raghandinê, her çû rola raghandinê girîngtir û ferehtir bû, cîhan tev bi hev ve girê da, nûçe kêlî bi kêlî




tête raghandin, hemû tişt li ber çavan zelal kir, asta zanîn û zanyariyê bilintir kir û hişyarî û hişmendî jî di civakê de belav kir.

Belê vê pêşketinê, bi xwe re hişyarbûneke bîrdozî û teknîkî mezin di civakan de çêkir, ji ber vê yekê jî rêjeya kesên ku dişopînin bilintir bû û bala biçûkan bêtirî mezinan kişand û pê ve hatin girêdan. Ji ber ku raghandin bûye dengê gel û çavê rastiyê û hikarî li ser helwest û nêrînên civakê vedike, desthilatdarên ne domekrat dixwazin raghandin di xizmet berjewendiyên wan de be û herwiha li gor mejiyên wan ên teng raghandin ji rola wê ya bingehîn bi dor dixin û di warekî gurkirî de têvedidin, ji ber vê jî, eger raghandineke serbixwe û azad tunebe, sazî û dezgehên di warê raghandinê de wê karê xwe bi awayekî rasterast û dispilînkirî ranebe û ne jî wê rêzdariya zagonên xwe bike, û bi vî awayî mafê rojnamevanan nayê parastin, raghandin dê pêş nekeve, bihêz û ektîv jî ne be.

# Rûmetkirina Gernasan!

**M.Duderî**

Binavkirina bajar, kolan, meydan, dibistan. hd û çêkirina peykeran ji kesên navdar û payebilind re qerdişeke(adet) mirov a kevin e. Mebest jê ew e, ku bîranîna kesên gernas, navdar ku karên balkêş û cudawaz kirine di agaha xelkê de bimînin, bibin pêşeng, nimûne û têvedêr ji bo pêkanîna karên baş û hêja ji civak û mirovatiyê re.

Li serdemên berê ew tişta ji Xweda, qeral û ji rêberên leşkerê û lehengên cengan re dihat kirin. Lê ji serdemên nêzîktir de, ew gerdişa feretir bû û ji bilî Xweda, qeral û rêberan, zanyar, hunermend û kesayetiyên civakî jî hatin rûmetkirin, navên wan jî li der û cihan hatin kirin û peyker jî li maydanan hatin venandin.



Ew mirovên ku di dîrokê de têne nasandin û navên wan têne hildan, ne mirovin e mîna bilî xwe xwe ne. Wan tiştine awarte ji mirov re kirine, tiştine nû afrandine û rola wan di warekî ji warên civak û jiyana mirovatiyê de bi bandor bûye. Ango wan kesan erêkirneke erênî ji tevaya civaka xwe wergirtine, sazî û damezrawên wê li ser payedariya wan erê kirine û paşê ew hatine rûmetkirin û pîrozkirin. Çinkî eger ne wilo be, û her hozek serokê xwe, her saziyeke karkerekî xwe, an partiyek rêber an endamekî xwe vebjêre û navê wî li derekê bike yan peykerekî jê re çêke, pirs wê tevlîhev bibe, giringî û mebest jê namîne, erzan dibe û belkî dibe ciyê tinaziya xelkê jî.

Pîrozkirin û nemirdîkirin ne tenê ji mafê serok dewlet, rêberên siyasî û hd. Belkî stranbêjek, nivîskarek, zanyarek, helbestvanek, hunermendek û kesekî xwedî bendoreke erênî ji rêberekî siyasî û gelek navdarên din bêtir hêjayî payebilndkirin û nirxandina civakê be.

Di vî warî de û da ku şaşbûn çênebin, nav û peykerên rast li çihên rast werin danîn, mafê gernas û payebilindan were nasîn, şêwra bi xelkê û saziyên civakî pêwîst û giring e; ango gerek e bi xelkê were rawêjandin(şêwrîn) û nêrîna wan were birin, ne tenê partî, aliyekî siyasî yan îdarek wan biryaran bistîne û kesê ku li ser şopa wê be were rûmetkirin.

Ev gotina ji Rêvebirya Xweser li navçeyên kurdî re tê gotin. Çinkî roja îro ew navan li deran dike, peykeran datîne û xwe di ber karê wiha de berpirsiyar dibîne. Eger şaşîtiyek hebe, xelk ji kesî fedî nake û nêrîn û rexenyên xwe dibêje; eger vebjartin rast û durust be jî, dîsa nêrîna xwe dibêje, spas dike û dilşahiya xwe dide xuyan. Bila em ji dîrokê û ji gernasên xwe re dilsoz bin. Bila dîrok bi sîngê me negire, çavan di me de beq neke, awiran li me nekşîne û nebêje "van jî gernasên xwe di jiyan û mirina wan de zulumandin".

# Hilma Axê

**Zozan Ebdo**

Niha li van kolanên ku hîna ez vê re ne bûme dost... Tê bîra min, ku min çend caran pênûsa xwe di nav hestên penaberiyê de gerandiye û li ser jiyana koçberiyê nivîsandiye. Lê ema nayê bîra min ger carekê wan peyvên êşê yên ku ji xeyalên min diweşiyan, ji min re gotibûn ku ez ê jî rojekê bibim koçber yan penaber, ku rojekê bê û ez ê lebatekê ji giyana xwe bijîm.... Ku ez ê di demekê ji van demên jiyana xwe de dûrî Efrîna xwe bimînim. Lê a niha ez bûme ew kesê ku min di çîrokên xwe de qala wî dikir e, ew kesê ji hertiştî dûr maye, belkî ji xwe jî. Ma gelo ew nivîs û êş, giş pêhesîna pêşerojê bûn?!! Dibe ku ger niha ez dîsa vegerim û li ser jiyana dûriya welêt binivîsînim, wê gotara min ya îro ji ya wan rojan xweştir û watedartir xuya bike, çimkî wergerandina mirov ji hestên hundirî xwe re, ji xwendina hestên hundirî xelkê bi encamtir, ji hêleke din ve peyvên ku ji malçûka êşê dizên, didin ser peyvên ku di landika xeyalê mirov de radizin. Diramim, dihizirim û kûr didim berhev lê di encamê de dibînim ku dîsa ev dera biyaniya min û heta yên kesên din jî, perçeyek ji zemîna xwedê ya fireh e, dîsa li erdên biyanî weke li welatê me, her sibeh tîrêjên rojê dêmên erdê radimûsînin, dîsa şev landika heyv û stêrka ye, dîsa li van erdên biyanî baran, berf, zivistan, payîz û buhar tev havînê û hertiştên din ve rûyên xwezayê yên curbecur in, lê çima buhar li van welatan bê reng e?!.. Tenê kirasekî



rengxwelî bi ser bejina xwe de berdaye?!! Çima wa hilma axê piştî baranê ya xweş ji van erdan nayê?!! Çima evqas perwan û kulîlk ne dost in?!! Çima welat ji hertiştî şêrîntir dimîne?... Ji xwe dipirsim carek...du car...û deh car jî, lê ji dêvela ku bersivekê bibînim, ez di nav pirsên hîn dijwartir de noq dibim. Çima welat tevî hemû êş, kul û derdên giran dibe hembêza dilovan ya ku mirov li ser sînga axa wî bextewar dimîne?!!... Nizanim bo çi welatên ne welatên me tevî hemû şahî û derfetên jiyanê yên ji hundirî welêt baştir in, hertim mirov bi tiştek ji canê xwe miçiqiye hest dibe?!!... Êdî fêm dikim û ji xwe re dibêjim, wê çi welat be ew welatê ku ax û barana wî bi hev re ne dost bin?!!... Wê çi welat be, ew welatê ku hilma axê jê neyê?!!..

# TAJANA XEMSARIYÊ

**Îlham Osman**

Roj bi roj, hêz jê direve, lêdana dil dimiçiqe, geşbîna çavên reş ziwa dibe, êşa giran govdeya wê dihelîne û dispêre nevîna xemsariyê... Gava berbang dikene, bi keziya qîlreş dilîze û diqumîne canê westî, ta ku navnîşaneke şadî di sîngê hêviyên nûjen de bikute, hestên sotî bersiva bercandanê qut qut dide..... Lê, ta dil lê dide mirin direve. Gavên giran di sîngê erdê de dadiçikîne û neçar dimîne bi domandina jiyanê re bimeşe. Di kûrahiya awiran û vedenga axîferan de dikeve bîreke bêbinî!!!!!

Pirsekê ew dixwar, gelo çawa êşê û kêfê bi hev re dikin heval?! Çima kulan ew perçiqandiye û ji birînên wê lehiya xeman herkandiye?! Bêguman! xaleke winda heye!! Divê di bagera wê valahiyê de nemîne... Li hember heyveke panzdeh rojî li ser çokan ket û bergerîna vejînê ji rûseriya ku ew dorpêç kiriye, gazî kir... Çavên xulmaş radestî



xeweke giran kir, belkî sibeheke gulane di asoya xeman de bihin vede û kembera keskesorî li newqa jiyana wê bigerîne....

**Mizgotina ....Dûmahîk**

hebûna gelek miletan bi dawî anîne û gelek miletên ku hevçerxên me bûn, tenê di nav rûpelên mêjûyê de mane. Lê, Kurdê ku ji xebatê çavşikandî nebûye, eniya xwe ya tev xwîn bilind kiriye û «Ez nemirime, ez namirim!» gotiye.

Mêjûya hîç miletekî wek mêjûya me xwînî nebûye. Welatê hîç miletekî wek welatê me neketiye ber şepa pêlên dagîrkeran. Hîç Miletekî wek me bê rawestan şer nekiriye. Di bin mercên herî ne wek hev de jî, qebqeba hêzên xurt ya cengxwaziyê, digel pirbûna hejmareke serdestiya leşkerî jî, Netewa Kurd hemî deman «Bila!» gotiye.

Belê, penda hebûna me hemî, raza doza me hemî bi vê peyvê ve peywendîdar e.

Ey xortê Kurd yê ku hêvî û paşeroja Nîjada xwe ye, evê nivîsa herzan pêşkêşî te dikim. Li vê feryada Kurdekî Dersîmî ku dûrî welatê xwe, li welatê bîgane(xerîb), yê ku dilê wî bi azara netewî dişewite û giyanê wî ji têhniya hilatina hetava azadî û serxwebûna Kurd peritiye, raperîna roja tolhildana kurdekî derbeder bi hêviya zend û bendên te ye, guhdariya min bike…

Ji bo namûs û rûmeta te nehête kirêtkirin, ewên ku ji nav çavên gaberên asê û ji gopîtka zinarên metirsîdarî welatê xwe berew himbêza mirina rihakar xwe avêjtin, feryada bi hezaran keç û bûkên me ez ji bo te dinalînim.

Heta bi îro jî, yê ku li ber dergehê dijminê namerd, di bin nîrê kolewariyê de dijî, hemî rojan, hemî gavan yê ku dilop dilop dimire, yê ku netewa wî, zimanê wî û hemî pîroziyên wî tê kirêtkirin, êş û rondikên kurdê kole ji bo te dibarînim.



Tenanet gunehê wan çima ku Kurd çêbûne, ji zozanên têrhetav, ji çiyayên gewherî Kurdistan yên ku hatine mişextkirin û li deştên hişk û zuwayî Enetolyayê, ji birsa de, ji serma de yên ku hatine qirkirin, bi gule û singoyên dijminê nemerd yên ku hatine kuştin, gava ku mirinê çavên xuşk û birayên me digirt, di asoyên hêviya wan de mîna hilatina hetavê ez te dibînim.

Wesiyetnameyeke wan î dijwar, xurt û fermandar ku di yek peyvê de binecih bûye, ji bo te heye:

TOLHILDAN!

TOLHILDAN!

Tolhildan! Ji bo pakirina namûsa Kurd ya ku hatiye kirêtkirin.

Tolhildan! Ji bo rawestandina bi sedhezaran zarokên Kurdan ku bi serê singoyan ve hatine helawîstin.

Tolhildan! Ji bo rawestandina qêrîn û nalîna keç û bûkên me ku di asoyên Kurdistan de, di kortalan de, di nav agiran de termên wan dihatin şewitandin.

Tolhildan! Ji bo bicihanîna amanca bi hezaran xwegorîkirên ku taca pakrewaniyê danandin ser serên xwe û li bin sîbera sêdaran bi ciwantirîn şêweyê lehengane bixêrhatina mirinê kirin û «Bijî Kurdistana Azad û Serbixwe» gotin.

Tolhildan! Ji bo vegirtina Dayîka me Niştîman, ewa wêran ku jê re Kurdistan tê gotin.

Tolhildan! Ji bo pakirina Niştîmanî Kurd ji giyanê çepel î nîjada Çeqel û Keftaran ku li şûnwarên Kurdan direwin.

Tolhildan! Ji bo bê dengkirina rewîna kûçikên ku li paş wê bedkara ku jê re «Şaristanî» tête gotin xwe vedişêrin.

Tolhildan! Tolhildan! Tolhildan!..Wesîyetnameya li ser termên tev xwîn yên pakrewanên me ku bi xwînê, bi rondikên çavan hatiye nivîsîn, tenê ev peyv e!.

Her kesekî ku namûsa wî hebe, her mirovekî ku di sîngê de dilê wî bi Kurdî lê bide, her gencekî ku di rehên wî de xwîna Kurdîniyê diherike, divêt vê wesiyetnameyê ji bîr neke. Heta bicihanîna vê daxwaza pîroz divêt nenive, raneweste û bixebite!.

Ew nifşên Kurd yên ku bi xwîna xwe mêjûya me ya duhî nivîsîn, şopandina rêçika wan ya ku bi xwîna xwe vekirine, erkê me ye. Emê bi xwîna xwe elendên sor î serxwebûna Kurdewariyê vekin. Bi vê kelekela di hinavê me de, emê hetava bi xumam yay a rizgariya Kurdewariyê biafirînin.

Mêjûya cîhanê li me dinêre.

Çavên pakrewanên me li rêya me ye.

Bi hezaran xwegorîkirên ku xwe pêşkêşî xwedayê azadiyê kirine, ji bo xwe goristanekê ji me dixwazin. Ji bo şemalkên xwe bendewarên Perestgahekê ne.

Ev Perestgah jî Kurdistana azad û serbixwe ye!.

Ev Perestgah, bi daxuyakirina cihê xwe yê bi rûmet li rêza Komela Miletan Dewleta Kurdî ya Paşerojê ye, da em bikarin giyanê pakrewanên xwe şad bikin!.

Her bijî Miletê Kurd yê ku lehengan diafirîne


Her bijî Kurdistana azad û serbixwe.

**Dr. Nûrî Dersîmî -1948**

# Mizgotina NÛRÎ DÊRSIMÎ ....

## Ey nifşên gelê Kurd

*((li roja 22 Gelawêjê 1973an, têkoşer û nemirê gewre Dr. Nûrî Dêrsimî goça xwe ya dawî li xerîbiyê li bajarê Helebê kir û li ser daxwaza wî li Navça Efrînê li Pîrozgeha Henên hate veşartin. Bi boneya 44saliya goçkirina wî, em Mizgotina(wesek) wî ji keç, xort û gelê Kurd re biweşînin... Rêz û silav ji axa gora wî û her nemir û pakrewanekî azadiyê re)).*



Ey xortê Kurd, ey jêvemayê Miletê ciwanmerd yê ku sîtema sedsalan ji bo xwe kiriye kozik û çeper, guhdariya min bike.

Li serdema spîbûna elenda(berbang) mêjûya mirovatiyê, ji derava Hindê berew Qefqasan, ji piyakên Asyaya biçûk ku xwe dirêjî heta bi Asya Navîn dike, li van çiyayên bilind û li van zozanên têrhetav(têroj), evê ronahiyê tîrojên xwe li eniya Nîjada te ya payebilind daye.

Mêjûya te mêjûya şûnwarên lehengiya bê navber û berdewam e. Ji ber ku tu paşmayê miletekî wusayî ku ji serê çel sedsalan de ye ji bo hebûneke aza û bi rûmet dicenge û îro bi xwe jî ji vê cengê nereviyaye.

Lêgerîna reh û egerên rûbirûmana azarkêşî û kambaxiyên jiyana kurdewarî ya duhî û ya îroyîn ku ji bahoz û bagêran dagirtiye, vekolîna yariyên(lîsk) dîrokê bi çavekî hişyar erk û barê me hemiyan e.

Ji bo hebûn û kesatiya xwe hîç miletek wekî me bi cengên dûr û dirêj ve ranebûye. Bi dirêjahiya dîroka me ya kûr û dûr, hîç hêzekê nekariye herêkirina(perjrandin) têkçûnê bi me bide herêkirin. Serê mirovê Kurd, li hemî deman mîna gopîtkên(poz) bilindî çiyayên welatê xwe herî bilind maye û li pêşberî yek dagîrkerî neçemiyaye. Rastiya jînenîgariya kurdewarî, rastiya bê xwarî ya îroyîn e jî.

Ji ber ku mirovê Kurd, xebata man û nemanê ticaran nehêlaye, serdestî li ser xwe herê nekiriye, biryara cîgirtina xwe li rêza miletên cîhanê daye û daye xuyakirin ku miletekî dixwaze ji bo jiyanê jî bimire.

Ey lawê Kurd, ey keça Kurd, divêt cîhana me agah ji vê biryara te hebit!.

Her heyîneke ku nevêt bimire divêt şer bike!.

Her miletekî ku bixwaze li rûzemînê cihê xwe hebe divêt şer bike!.

Gerdişa(`urf) suruştî ya ku nahête guhertin ev e!.

Gerdişa hevrikî ya herî dijwar, ya cîhana Kîmyayî, Giyayî û Giyanewerî ev e. Şer û Ceng e!..

Ev gerdiş, ji bo beşê mirovan hêj dijwartir e. Nîjad ji bo Nîjadê, Milet ji bo Miletî, mirov ji bo mirovî ejdehayekî bê mehrevan e.

Ji bo guhertina vê gerdişê şaristaniya mirovatiyê hêj negehiştiye û hêj nekariye yasaya cengê biguhere. Îro jî, ji bo jiyanê şerkirin divêt. Rev mirine!..

Em miletekî zindî ku naxwaze bimire. Mirovê Kurd biryara xwe ya jiyanê daye û wê bijî.

Bi dirêjahiya mêjûya me ya kûr û dûr gelek nîjadan, gelek miletan û gelek dewletan, ji bo mirandina Kurd û Kurdewariyê xebitîne. Bêparkirina Kurdan ji jiyanê ji bo xwe kirine amanc. Lê, nekarîne evê daxwaz û amanca xwe bi cih bînin.

Ji Rojava, ji Başûr û ji Bakûr hatina pêl bi pêl hêrişên cîhangîran li quntarên çiyayên Kurdan yek bi yek hatine şikandin û li hemberî payebilindiya Kurd ji hev hatine perçivandin.

Hêzên xurt yên ku herikîna mêjûya cîhanê guhertine û ........ 

7

Azadî ji girtiyên siyasî û xebatkarên gelê me yê Kurd re, yên di girtîgehên Sûriyê de